Xutbeya Kurdî (Kürtçe Hutbe)

QÎMETA XWENDINÊ

﴿اقْرَأْ بِاسْمِ رَبِّكَ الَّذِي خَلَقَ ﴿١﴾ خَلَقَ الْإِنْسَانَ مِنْ عَلَقٍ ﴿٢﴾ اقْرَأْ وَرَبُّكَ الْأَكْرَمُ ﴿٣﴾ الَّذِي عَلَّمَ بِالْقَلَمِ ﴿٤﴾ عَلَّمَ الْإِنْسَانَ مَا لَمْ يَعْلَمْ ﴿٥

1 – Bi navê Rebê xwe yê ku afirand, bixwîne.

2 – Wî mirov ji şaneyeke ku dizeliqe afirand.

3 – Bixwîne! Kerema Rebê te bêdawî ye.

4 – Ew e ku nivîsandin bi qelemê hîn kiriye.

5 – Ew e ku tiştên mirov nizanibû, hînî wî kiriye. (Eleq, 96/1-5)

Gelî Misilmanên muhterem!

Hutbeya me li ser qîmeta xwendinê ye.

Di destpêka nubuwetê de, ayetên yekem û sêyem ên sûreyê ku li Mekkeyê wek sûreyê ewil nazil bûye, bi emrê “Bixwîne” dest pê dikin. Emrê yekem ê Qur’anê yê derbarê kiryarên mirovan de “BIXWÎNE” ye. Ji ber vê yekê, divê em ji her kesî zêdetir bixwînin.
Di Qur’ana Kerîm de wiha tê buyûrîn:

إِنَّمَا يَخْشَى اللَّهَ مِنْ عِبَادِهِ الْعُلَمَاءُ

“...Ji nav bendeyên Allah, tenê alim bi awayê ku divê rêz û te‘zîmê nîşanî Allah didin...” (Fatir, 35/28)

Her wiha Allah di Qur’anê de şîretê li Pêxemberê me dike ku wiha dua bike:

وَقُلْ رَبِّ زِدْنِي عِلْمًا

“Rebê min! Îlmê min zêde bike.” (Taha, 20/114)

Xwendina pirtûkên ku mirov digihînin Rebê wî û wî digihînin armanca ku ew di xeyala xwe de dibîne, pir pêwîst e.

Mirovatiya mirov bi fêrbûn û hînkirinê derdikeve holê. Ji ber vê yekê, kesên ku fêrbûn û hînkirinê îhmal dikin, her çiqas sax bin jî, wek mirî tên hesibandin. Ji ber ku mebesta afirandina mirov ew e ku bibîne, bizane û tiştên ku fêr bûye hînî kesên din bike. Qedir û qîmeta her kesî li gorî naverok û dewlemendiya îlmê ku wî bi dest xistiye ye.

Pirtûk dermaneke baş e ji bo dirêjkirina emrê mirov. Her kesê ku ji pirtûkan hez dike û wan dixwîne, jiyana wî tijî, dewlemend û dirêj dibe. Ji ber ku dijminên herî mezin ên mirov bêkarî û tembelî ne. Ev jî dibin sebebê stresê. Stres jî nîşana nêzîkbûna mirinê ye. Rêya rizgarbûna ji vê rewşê xwendina pirtûkan e. Xwendina pirtûkên baş di hundirê mirov de heyecaneke manewî çêdike. Ev hest jî mirov teşwîq dikin ku pirtûkên bi vî rengî bixwîne. Bi vî awayî, “derdoreke salih” çêdibe.

Bêguman, dema em qala pirtûkan dikin, mebesta me pirtûkên bi fayde ne. Lewra Pêxemberê Pêxemberan bi gotina “Ya Rebî! Ez ji îlmê bêfayde xwe dispêrim te”, ji îlmê bêfayde xwe avêtiye dergahê Xwedê. (S. Muslim: Zikir, 73, Hejmara Hedîsê: 2722)

Kesê ku pirtûkên bi fayde dixwîne, lêrîna wî berfireh dibe. Ji ber vê yekê, ew ji taassubê dûr dimîne û xwediyê tesamûheke mezin dibe.

Mixabin, her çiqas îstîsnayên vê hebin jî, yek ji taybetiyên herî berbiçav ên gelê me nexwendin û nefikirîn e. Tişta ku me bêberhem dike jî, ev e.

Erê, nexwendina pirtûkan yek ji kêmasiyên me yên herî mezin e. Ji bo ku em vê kêmasiyê çareser bikin, divê em her dem û pir bixwînin. Divê em her roj hewl bidin ku tiştekî nû fêr bibin. Li malê û

li cihê kar, divê em herî kêm demeke diyar ji bo xwendinê veqetînin.

Divê em di vê mijarê de jî bibin nimûneyeke baş ji bo neslê xwe. Bi vesîle û rêbazên cuda divê em rêya xwendinê ji wan re vekin. Her wiha divê em eşq û şewqa wan zêde bikin, da ku Îslamê fam bikin û ji kesên din re jî bibêjin**.**

Xwendin û fêrbûn ne karên demkî ne ku tenê di hin demên jiyanê de bên kirin. Divê xwendin û fêrbûn her dem berdewam bin.

Heke em dixwazin di nav mirovan de xwediyê cihekî bi rûmet bin, divê em pir bixwînin. Ji bo ku mirov di jiyanê de bi ser bikeve, tenê şertek heye, ew jî dostaniya bi pirtûkan re ye.

Mirov bi peyvan difikire. Mirov çiqas zêde peyvan bizane, asoya fikra wî ewqas berfireh dibe û asta zekaya wî jî ewqas bilind dibe. Ji bo dewlemendbûna xezîneya peyvên mirov, xwendina pirtûkan ji dîtin û bihîstinê bi tesîrtir e. Pîvana herî zelal a ji bo pîvandina zekaya mirov, xezîneya peyvên wî ye.

Zeka mîna masûlkeyên bedenê ye. Mirov çiqas wê bixebitîne, ewqas pêş dikeve. Rêya xebitandina mejiyê mirov, çareserkirina pirsgirêkan û ezberkirina peyvan e. Mirovê ku bi xwendina pirtûkan zekaya xwe pêş dixe, mijarên ku dixwîne zûtir fam dike.

Ji bo kesên ku naxwînin û fêr nabin, pir zehmet e ku asta xwe biparêzin û eşq û şewqa xwe ya xizmetê bidomînin. Di dirêjahiya dîrokê de, kesên ku têr fêr nebûne, her dem pirsgirêk derxistine. Lewra heke kes mijarên ku divê bizanin, bi awayekî rast û berfireh nizanibin û li gorî wê zanîna rast tevnegerin, her dem dikarin bibin sebebê pirsgirêkan.

Ji bo ku em manewî nebin wek cesedên bêcan, divê em karê xwe bi ciddiyetê bigirin, çavkaniyên ku me xwedî dikin bi şuûr bixwînin, bi hev re fikirên nû derxin holê û muzakere bikin.

Pirtûkên ku bi hev re tên xwendin û muzakerekirin, mîna nimêja ku bi cemaatê tê kirin, pir bi bereket in.

Kurteya pirtûkên ku tên xwendin divê bê derxistin. Herî kêm, mirov piştî xwendina her beşê ji xwe bipirse: **“Min ji vir çi fam kir?”** û di hişê xwe de kurteya wê derxe. Bi vî awayî mirov dikare heta radeya herî bilind îstîfade bike.

Ji ber vê yekê, divê fedayiyên muhebbetê di mijara xwendinê de jî, wekî ku seferberiyeke giştî îlan bikin, xwe bidin xwendinê. Êdî xwendin ji bo me bûye zarûret.

Li dibistanan mirov fêrî xwendin û nivîsandinê dibin. Lê ya bi rastî girîng ew e ku şagirt bi şuûra xwendina pirtûkan bên perwerdekirin û pirtûkên bi fayde bidin wan bixwînin.

Her kesê ku îman aniye, bê şert û merc divê bi şuûr pirtûkan bixwîne û pêwîstiya xwendinê di kûrahiya ruhê xwe de hîs bike.

Em her tiştî bixwînin. Lê berî her tiştî, em berhemên xwe bixwînin. Ji ber ku ew ji bo me her tişt in.

Erê, ji bo ku em bigihîjin armanca xwe ya ku em li pey wê ne, em ê hin organîzasyonan ava bikin û sîsteman pêş bixin. Lê ev ji bo me mijarên pileya duyem in.

Mebesta bingehîn a civîn û hatina me ya ba hev divê xwendin û xwendandin, fêrbûn û hînkirin, pêşxistina xwe û kesên din, duakirin û xwendina ewrad û ezkaran be.

Cenabê Heq ji me re lutf bike ku em meclisên xwe bi Qur’anê, zikrullahê, îbadet û taetê, tefekkurê, duayê û xwendina pirtûkan bi bereket bikin. Xwedê me di pêkanîna wan mijarên ku me niyet kiriye û kirine armanca xwe, muvaffeq bike.

Cenabê Heq ji me re lutf bike ku em meclisên xwe bi Qur’anê, zikrullahê, îbadet û taetê, tefekkurê, duayê û xwendina pirtûkan bi bereket bikin. Xwedê me di pêkanîna wan mijarên ku me niyet kiriye û kirine armanca xwe, muvaffeq bike.

Kurteya Xutbeyê (Hutbenin Özeti)

QÎMETA XWENDINÊ

﴿اقْرَأْ بِاسْمِ رَبِّكَ الَّذِي خَلَقَ ﴿١﴾ خَلَقَ الْإِنْسَانَ مِنْ عَلَقٍ ﴿٢﴾ اقْرَأْ وَرَبُّكَ الْأَكْرَمُ ﴿٣﴾ الَّذِي عَلَّمَ بِالْقَلَمِ ﴿٤﴾ عَلَّمَ الْإِنْسَانَ مَا لَمْ يَعْلَمْ ﴿٥

1 – Bi navê Rebê xwe yê ku afirand, bixwîne.

2 – Wî mirov ji şaneyeke ku dizeliqe afirand.

3 – Bixwîne! Kerema Rebê te bêdawî ye.

4 – Ew e ku nivîsandin bi qelemê hîn kiriye.

5 – Ew e ku tiştên mirov nizanibû, hînî wî kiriye. (Eleq, 96/1-5)

Gelî Misilmanên muhterem!

Hutbeya me li ser qîmeta xwendinê ye.

Di destpêka nubuwetê de, ayetên yekem û sêyem ên sûreyê ku li Mekkeyê wek sûreyê ewil nazil bûye, bi emrê "Bixwîne" dest pê dikin. Emrê yekem ê Qur'anê yê derbarê kiryarên mirovan de **"BIXWÎNE"** ye. Ji ber vê yekê, divê em ji her kesî zêdetir bixwînin.

Di Qur'ana Kerîm de wiha tê buyûrîn:

إِنَّمَا يَخْشَى اللَّهَ مِنْ عِبَادِهِ الْعُلَمَاءُ

"Ji nav bendeyên Allah, tenê alim bi awayê ku divê rêz û te'zîmê nîşanî Allah didin." (Fatir, 35/28)

Her wiha Xwedê di Qur'anê de şîretê li Pêxemberê me dike ku wiha dua bike:

وَقُلْ رَبِّ زِدْنِي عِلْمًا

"Rebê min! Îlmê min zêde bike." (Taha, 20/114)

Birayên hêja!

Mirovatiya mirov bi fêrbûn û hînkirinê derdikeve holê. Qedir û qîmeta her kesî li gorî îlmê ku wî bi dest xistiye ye. Xwendina pirtûkan asoya fikra mirov berfireh dike, zekaya wî pêş dixe û wî ji taassubê dûr dixe.

Bêguman, dema em qala pirtûkan dikin, mebesta me pirtûkên bi fayde ne. Lewra Pêxemberê Pêxemberan bi gotina:

"Ya Rebî! Ez ji îlmê bêfayde xwe dispêrim te."

Ji îlmê bêfayde xwe avêtiye dergahê Xwedê. (S. Muslim: Zikir, 73, Hedîs: 2722)

Misilmanên ezîz!

Mixabin, yek ji kêmasiyên me yên herî mezin nexwendina pirtûkan e. Ji bo vê yekê divê em her roj demekê ji bo xwendinê veqetînin. Divê em ji neslê xwe re bibin nimûneyeke baş û zarokên xwe jî teşwîqî xwendinê bikin.

Xwendin û fêrbûn ne karên demkî ne. Divê heta dawiya emrê me berdewam bikin. Her kesê ku îman aniye, divê pêwîstiya xwendinê di kûrahiya ruhê xwe de hîs bike.

Mebesta bingehîn a civîn û hatina me ya ba hev divê xwendin û xwendandin, fêrbûn û hînkirin, pêşxistina xwe û kesên din, duakirin û xwendina ewrad û ezkaran be.

Birayên muhterem!

Cenabê Heq ji me re lutf bike ku em meclisên xwe bi Qur'anê, zikrullahê, îbadet û taetê, tefekkurê, duayê û xwendina pirtûkan bi bereket bikin. Xwedê me di pêkanîna wan mijarên ku me niyet kiriye û kirine armanca xwe, muvaffeq bike. **Amîn.**